# ‘Ez qatilê keça xwe me’

**Eylem Pesen li Wanê ji aliyê hevserê xwe ve bi awayekî hovane hate kuştin. Bavê Pesenê go ku ji ber ew li keça xwe xwedî derneketiye wijdanê wî nerehet e û xwe wekî qatilê keça xwe dibîne**



EYLEM Pesen ku hê diçû lîseyê, ji aliyê malbata xwe ve ji dibistanê tê girtin û bi zorê tê zewicandin. Ji ber ku temenê wê biçûk bûye zewaca fermî nehatiye kirin. Gelek caran Eylem Pesen ji ber zilma hevserê xwe hatiye mala bavê xwe, lê her tim ew hatiye îknakirin û ew vegerandine cem hevserê wê. Bavê Eylem Pesen, Necmettîn Pesen got ku ji ber wî keça xwe bi zorê zewicandiye li hemberî vê bûyerê xwe sûcdar dibîne û wiha got: “Qatilê keça min hem ez im û hem jî zavayê min ê hov e.”... RÛPEL - 7

## MEHMÛD OSMAN:

# Divê konferansa kurd pêk bê



Parlamenterê kurd Mehmûd Osman der barê Konferansa Neteweyî ya Kurd de ku hatiye taloqkirin de nêrînên xwe anîn ziman û wiha got: “Divê ji çar parçeyên Kurdistanê kurd di vê konferansê de li hev bicivin û stratejeyeke hevpar daynin holê.” Mehmûd Osman diyar kir ku dewleta tirk ji Herêma Federal a Kurdistanê dixwaze li hemberî PKK’ê şer bikin û anî ziman ku tiştekî wisa tu caran çênabe... RÛPEL - 4


# Hawar

Rojnameya Rojane

21 Gulan 2009
Pêncşem
Sal: 1
Hejmar: 16
Buha: 50 Kr


# Diyalog dê riya çareseriyê veke

**Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, diyar kir ku ji bo pêşketina pêvajoya demokratîk û aştiyane girîngiyê didin diyalogê. Turk, got heke pêşketineke erênî çêbe dê tesîreke baş li pêvajoya demokatîk bike û ji bo hewayeke siyasî ya baş derkeve holê berpirsyariyên mezin dikeve ser milê her kesî**

### PÊŞKETINA REFLEKSA DEMOKRATÎK GIRÎNG E

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku li parlamentoyê bi rojnamegeran re hat cem hev, têkildarî mijarên di rojevê de daxuyanî dan. Turk ku bersiv da pirsa têkildarî tevlêbûna DTP'ê ya merasîmên 19'ê Gulanê, wiha got: "Diyalog girîng e. Dema hişmendiya diyalogê pêk bê, di mijara pêşketina refleksa demokratîk de jî dê her kesî ber bi fikreke erênî ve bikişîne.” Turk, li ser pirsa di randevuya ji Serokwezîr hatiye xwestin de tu pêşketin heye an na jî wiha got: "Heta niha bersiveke erênî yan jî neyînî nehatiye dayîn.”

### ‘LI PARLAMENTOYÊ DIVÊ ÇARESERÎ BI PÊŞ BIKEVE’

Turk ku daxuyaniyên Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal ên têkildarî pirsgirêka kurd nirxandin, wiha got: "Parlamento neynika vî welatî ye. Helwesta partiyên siyasî ji bo pêvajoya aştiyê girîng e û dê piştgiriyê bide. Di vê mijarê de roleke mezin dikeve ser milê hemû partiyên siyasî. Baweriya me ew e ku hevdîtina bi MHP'ê re jî dê bi fêde be. Em dikarin di mijara pirsgirêkên bingehîn ên welat de rûnin û nîqaş bikin. Berpirsyarî û nêzîkatiya ku CHP nîşan bide ji vê hêlê ve girîng e.”... RÛPEL - 4

### Rojên krîtîk û 1’ê hezîranê

Vê carê tiştekî muhîm heye ku êdî beşeke girîng a rewşenbîr û nivîskaran (Hasan Cemal jî di nav de) wekî şertê pêşîn ‘bêdengkirina çekan a her du aliyan’...

Tayîp TEMEL 2

### Divê hin gavên berbiçav bêne avêtin

Pirsgirêk her tim bê gotûbêjkirin û neyê çareserkirin jî xetere ye. Heta dibe ku her ku biçe di nava civakê de bêbaweriya ji çareseriyê bi pêş bikeve...

Sercan AYDIN 2



### ÎHD: Astengiyên li pêşiya kurdî rakin

Şaxa ÎHD'ê ya Amedê têkildarî rakirina astengiyên li hemberî kurdî û bikaranîna kurdî ya di qadên cemaweriyê de raporek amade kir. Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Muharrem Erbey diyar kir ku divê astengiyên di Makeqanûn, zagon û rêziknameyan de li hemberî kurdî hene bên rakirin û navên kurdî yên hatine guherandin bên îadekirin. Erbey diyar kir ku ji sala 1923'yan heta niha asîmîlasyon û qedexeyên li ser kurdî berdewam dikin. Lê qedexeyan nekarî pêşxistina kurdî rawestîne.




### Ji Medenî Ferho Rojbaş heval-Qendîl

Medeni Ferho, berî salekê çûbû Qendîlê. Piştî vegeriya, çavdêriyên xwe kire pirtûk. Çavdêriyên Medenî Ferho, tenê ne ji tiştên dîtine pêk tê; bi hestên xwe re, pergal, kar û xebat, rabûn û rûniştin û sosyolojiya gundî û gerîlayan jî dianî ziman. Di nivîsên Ferho de tê xuyakirin ku Qendîl ne tenê çiya ne, ne tenê cihê şer e. Ligel ku dar, devî, kevir, av, giha hatine şewitandin jî, jiyan di nava berxwedanê de ye û xwe nû dike... RÛPEL - 6



### Gora Apê Mûsa ziyaret kir

*Pîrozbahiyê 15’ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî bi çalakiyên cur bi cur yên wekî panel, şahî, şano û daxuyaniyan ve dewam dikin. Her wiha gorên mezinên kurdan bi vê boneyê tên ziyaretkirin. Bi heman sedemê li Nisêbîne gora Apê Mûsa jî hate ziyaretkirin û qurnefîl danîn ser gora Apê Mûsa. Li Êlihê jî li Mala Gel a Ahmet Kaya şahiya şano û muzîkê hate lidarxistin...* **RÛPEL - 6**

## Hevdîtin hat astengkirin

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Omer Guneş, Nurî Denîz û Şakîr Demîr bi armanca hevdîtina xwe ya hefteyî ya bi muwekîlê xwe re çûn navçeya Gemlîka Bursayê. Piştî muameleyên li Fermandariya Cendirmeyan a Gemlîkê, bi hinceta, "Muxalefeta hewayê" parêzer nebirin Girava Îmraliyê. Ocalan di hevdîtinên hefteyên borî de bal kişandibû ser çareseriya pirsgirêka kurd û daxuyandibû ku dê ji bo aştiyê nexşeyeke rê derxîne.

### Li Êlihê hovitiyeke din a cerdevanan

**PERGALA** cerdevaniyê bi komkujiya Zankirtê re kete rojevê. Hê komkujiya Zankirtê di rojevê ye bû hovitiyeke din a cerdevanan derkete holê. Cerdevanê bi navê Abdulkerîm Orak ku li gundê Dêrfan ê navçeya Kercewsa Êlihê dijî, Mence Oraka 5 meh berî niha ji kurê wî veqetiyayî û bavê wê Osman Orak (85) kuşt. Hate ragihandin ku bûyer duh pêk hatiye. Ji ber tirsa cerdevanan demeke dirêj cenaze li erdê man û nehatin hilanîn.

### Li Sakaryayê êrîşên lînçê ranawestin

**DI NAV** 4 salên dawî de li Sakarya û navçeyên wê li hemberî kurdan ev bû cara 6’emîn êrîşên lînçkirinê pêk tên. Balkêş e ku di êrîşa dawî ya nijadperestan de cereke din hedef kurd bûn. Ev 10 roj in ku li navçeya Akyaziya Sakaryayê di pêşengiya nijadperestan de li hemberî kurdan êrîş pêk tên. Herî dawî şevtira dinê ev dageriya şer. Di vê êrîşê de kurdek hat kuştin û 2 kurd jî bi giranî birîndar bûn... **RÛPEL - 3**

# Civaka tirk ji şer westiyaye

**Ji bo qebûlkirina îradeya gelê kurd û xwestekên wan yên demokratîk divê hêzên demokratîk tevlî mîtîngên DTP'ê bibin. Divê nîşan bidin ku tu kes nikare îradeya gelê kurd biperçiqîne û êrişên li ser DTP'ê rawestîne**

SERCAN AYDIN



Nivîskarekî gotiye em di nava şerekî wisa de dijîn ku di dinyayê de şerê herî dirêj e. Bêguman Tirkiye nêzîkî çil salî ye di nava rewşa şer de ye. Şerekî wiha dirêj û êrîşek li devereke din nîn e. Ji ber ku di nava rewşa şer de ye, beşên civakî tev dikevin bin wê bandorê. Civaka tirk jî di nava vî şerî de westiyaye. Digel ku dibêjin em ê îro biqedînin, sibê biqedînin, encamgirtin li aliyekî dewleta tirk her roj hinekî din diherişe.

Eger şerekî wiha dirêj diajo, sedemekî wê yê bingehîn heye. Jixwe eger dewleteke weke dewleta tirk ku xwediyê artêşeke pir bihêz e, eger di vî şerî de bi ser nakeve, sedemên wê yên civakî pir xurt in. Bingehên civakî û sedemên siyasî wisa bihêz in ku digel bikaranîna her rengê şerê gemar, Tevgera Azadiya Kurd li ser lingan rawestiyaye. Hem her ku dewleta tirk êrîş dike Tevgera Azadiya Kurd pirtir bihêz dibe.

Çawa ku helbestvanekî der barê bêçarebûna hêzên zordest li hemberî têkoşîna gelan de got: 'Li Kurdistanê berxwedan her roja ku diçe mezintir dibe.' Helbestvan bi helbesta xwe rewşa dewleta tirk û bêçarebûna wê ya li hemberî Tevgera Azadiya Kurd aniye ziman. Helbestvan wiha dibêje: "Her ku ez dikujim ew zêde dibin, Xwedêyo, ev çi pirsgirêk e".

Her ku şer dirêj dibe û her ku tê dîtin di vî şerî de serkeftin nîne, yên dibêjin pêwîst e ev pirsgirêk bê çareserkirin pir dibin. Li hemberî kurdan neheqiya şerê tê kirin tê dîtin. Çawa di hilbijartinên 29'ê Adarê de jî hat dîtin, tê fêmkirin ku gelê kurd wê neyê xapandin û îradeya wî neyê şikênandin. Kesên ku yekser ne parçeyên şerê li hemberî kurdan e, di wan de ev fikir pêş dikeve.

Li aliyê din beşên civakî û siyasetvan yên zîhniyeta xwe neguhertîn, lê li hemberî şer ketîn astengiyan, dibêjin; em dev ji armancên xwe bernedin lê em hinek tiştan bikin û bi wî awayî ruhê berxwedana kurdan bişkînin. Bi hesabekî wiha tevdigerin. Ev derdorên ku dibînin êdî siyaseta kevin bêbandor bûye, dixwazin amûrên siyaseta xwe û zemînê meşrûiyeta her işî jî ji nû ve bi ser hev ve bidin, nû bikin û bi awayekî din siyaseta xwe ya inkarê bidomînin.

Binketinên leşkerî yên sal û nîvê û hilbijartinên 29'ê Adarê li hemberî Tevgera Azadiya Kurd, dewleta tirk xistine zehmetiyan. Daxuyaniyên Tevgera Azadiya Kurd yên ji bo çareseriyeke maqûl Tirkiye hê pirtir xistiye rewşeke neheq.

Di demeke wiha de bi qasê ku di tu deman de wiha nehatiye dîtin, li ser pirsgirêka kurd gotûbêj tên kirin. Lê li navê îradeyeke xwediyê plan û çareseriyeke berbiçav nîne. Tişteke ku di pirsgirêkê de pêşketinan bide çêkirin dernaxin holê. Lê ku evqas tê gotûbêjkirin, bi awayekî xurt dide diyarkirin ku pêwîstî bi çareseriyeke lezgîn heye.

Lê belê heke pirsgirêkek her tim bê gotûbêjkirin û neyê çareserkirin jî bixeter e. Heta dibe ku her ku biçe di nava civakê de bêbaweriya bi çareseriyê pêş bikeve. Ji ber wê yên ku dibêjin pirsgirêkek heye, divê siyaseta xwe ya çareseriyê jî diyar bikin. Eger ne wisa be wê gotin werin wateya mijûlkirin û xapandinê. Çawa ku di nava kurdan de gumanên wiha derdikevin; dibêjin; gelo, dixwazin me bixapînin?

Rewşa ku van gumanan rast derîne heye. Lewre çawa ku projeyeke çareseriyê dernaxin holê, li hemberî DTP'ê jî ku dibêje divê ev pirsgirêk bê çareserkirin ketine nava êrîşê. Û ev êrîş dewam dikin. Tiştên ku dewleta tirk dike, tenê êrîşên ser DTP'ê ne. Diyar e ku êrîşên ser DTP'ê nayên wateya niyeta çareserkirinê. Piştî ku van gotûbêjan dest pê kir tişta herî balê dikişîne ev e; dibêjin; bê ku em hina mûxateb bibînin em pirsgirêkê çareser bikin. Wateya wê ya siyasî ev e; em naxwazin vê pirsgirêkê çareser bikin. Ev nêzîkatî israrkirina di zêhniyeta inkar û tunekirina kurdan de ye. Gotinên wan tên vê wateyê; tu kes nikare mafekî ji me bixwaze, em çi bidin divê bi wê razî bibin. Ev zîhniyeta otorîter û faşîzmê ye.

Wisa xuya dike ku bi vê zîhniyetê êrîşî DTP'ê dikin; ez ji bo kurdan çi layîq bibînim divê qebûl bikin. Bi vî awayî dixwazin kesên li hemberî siyaseta wan li ber xwe dide ji holê rakin. Li hemberî çareseriya PKK'ê ya maqûl, bê ku bi şidet red bikin, çawa ku li Tirkiyeyê nermayiyek hebe didin diyarkirin û ji vê rewşê sûdê werdigirin û êrîşî DTP'ê dikin. Eger niha hûn ji mirovekî ji rêzê bipirsin bêjin ka van kirinên dewletê şîrove bike, bersiva ku bide ev e. Di demekê de ku evqas êrîşî DTP'ê dikin tu kes bawer nake ku niyeta hikûmet û dewletê heye vê pirsgirêkê çareser bike.

Dewleta tirk bi serkeftina hilbijartinên 29'ê Adarê ket tengiyeke mezin. Di demekê de ku di mijara çareseriyê de her kes li benda vekirinên demokratîk bû, berûvajiyê wê, êrîşî DTP'ê kir ku nûnertiya îradeya gelê kurd ya siyasî dike. Serokkomarê tirk, serokwezîr û wezîrê karê hundir xwestin hewayeke wisa belav bikin, çawa ku xwestekên hêzên demokratîk bivaêjin pişt guhên xwe, çavên xwe ji êrîşên ser DTP'ê re bigirin û nêzîkatiyên rêveberiya KCKê yên ji bo çareseriyê û pêşniyarên maqûl bêbersiv bihêlin, serî li her riyê bidin.

Divê Tevgera Azadiya Kurd û hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê, ji bo gavavêtinên berbiçav zorê bidin dewletê. Di serî de divê zorê bidin dewletê ku destûreke bingehî ji nû ve bê derxistin û di vê destûrê de nasnameya kurd bê qebûlkirin. Di serî de perwerdeya zimanê dayîkê, divê azadiya çandê bê xwestin. Ji bo çareseriya rast divê qebûlkirina îradeya kurdan ya siyasî ya demokratîk bixwazin. Û di serî de divê rawesdandina êrîşên ser DTP'ê bixwazin. Ji bo qebûlkirina îradeya gelê kurd û xwestekên wan yên demokratîk divê hêzên demokratîk tevlî mitîngên DTP'ê bibin. Divê nîşan bidin ku tu kes nikare îradeya gelê kurd ya di 29'ê Adarê de derketî meydanê biperçiqîne.

## Deng — Rojên krîtîk û 1'ê Hezîran

tayiptemel@walla.com TAYÎP TEMEL

Ev bi rojan in der barê pirsgirêka kurd de ji devê rayedarên dewletê, serokomar û gelek rewşenbîran daxuyaniyên ku hêviya aştî û diyalogê didin raya giştî, bilind dibin. Bêguman aliyên erênî yên van daxuyaniyên ku bi çûna Hasan Cemal re ya Qendîlê dest pê kirin hene.

Lê ya balkêş ew e ku di vê pêvajoyê de ji aliyekî ve operasyonên li hundir û yên derve zêde dibin. Heta mirov dikare bêje ku operasyonên siyasî û leşkerî bêyî ku rawestin didomin.

Girtina DTP'iyan, nîqaşên der barê fezlekeyên parlamenterên DTP'ê yên li meclisê û gelek tiştên din…

Dîsa di demeke wisa de biryara Dadgeha Sîncanê ya der barê Serokomar Abdullah Gul de jî yek ji operasyonên siyasî yên li hemberî pêvajoyê ne. Wekî tê zanîn Sîncan ji bo kevneşopiya siyaseta îslamparêz cihekî sembolîk û xwedî girîngiyê ye. Ji ber ku li Sîncanê li hemberî desthilatdariya Erbakan tangên leşkerî daketibûn kolanan.

Wekî tê zanîn ku Tevgera Azadiya Kurd ji bo ku pêşî li van nîqaşên ji bo çareseriyê bê vekirin, heta 1'ê Hezîranê biryara bêçalaktiyê stand û ev biryara xwe ji hemû raya giştî re aşkera kiribû.

Lewre jî vê biryarê bandoreke erênî li nîqaş û munaqeşeyên li ser çareseriyê kirin û atmosfera ku derketiye holê cesaret da gelek rewşenbîr û derdoran jî.

Bêguman ji aliyê dewletê ve gelek nêrînên cuda tên rojevê û çi erênî û çi neyînî gelek fikir tên aşkerakirin.

Gelek caran pêvajoyên bi vî rengî hatin jiyîn û di encamê de felaketên mezintir derketin holê.

**Ferqa vê demê ji demên din**

Lê vê carê tiştekî muhim heye ku êdî beşeke girîng a rewşenbîr û nivîskaran (Hasan Cemal jî di nav de) wekî şertê pêşîn 'bêdengkirina çekan a her du aliyan' dibinînin. Ango nabêjin bila aliyek çekan deyne û teslîmî aliyê din bibe. Hasan Cemal û gelek siyasetmedar û rewşenbîrên din dibêjin; 'divê tu alî pêlî tetikê nekin'.

Ev nêrîn û rewşeke nû ye li Tirkiyeya ku her tim çîrokên teslîmbûn û serîtewandinê lê tên gotin… Kêm jî be hin derdoran êdî fêm kiriye ku bêdengkirina çekan a aliyekî ne bes e û çareseriyê jî nayîne. Niha heman derdor dixwazin ku PKK pêvajoya 1'ê Hezîranê dirêj bike û ji dewletê jî dixwazin ku vê pêvajoya bêçekbûn û pêlînekirina tetîkan bi awayekî nepenî bi cih bîne.

Em nizanin ka ev pêvajo dê bê dirêjkirin an na. Lê tiştek heye ku divê aliyên aştîxwaz ên li Tirkiyeyê û bi taybetî jî DTP di vê pêvajoyê de eniyeke mezin a aştiyê ava bike. Ligel nîqaşên ku têne kirin deklerasyoneke ku daxwaz û hêviyên ji bo aştî û çareseriyê tê de cih digirin û hemû derdorên aştîxwaz li dorê kom bûne dê xizmeteke mezin ji vê pêvajoyê re bike.

Heke ev yek neyê kirin, dê derdorên behsa çareseriyê dikin bi tenê bên hiştin û aliyên şerxwaz jî dê dengê xwe bilindtir bikin… Jixwe dengê yên wekî Baykal û Bahçelî pir bilind dibe.

Divê bêyî ku dem bê windakirin, DTP û derdorên aştîxwaz û demokrat bi tevlibûneke xurt deklerasyonekê ji bo aştî, biratî û çareseriyê aşkera bikin û ji bo herdu aliyan jî pêngavên ku bên avêtin diyar bikin. Heta şandina heyetan ji bo herdu aliyan jî dibe ku bandoreke erênî û pozîtîf li pêvajoyê bike.

## Tûjik — Rûreşiya sedsalan didome



Medenî Ferho

medeniferho@hotmail.com

Sedsala bîstan rûreşiya mirovahiyê ye, komkujî û wêranzariya gelan, wek damxeyekê li pêçavê sedsalê ket. Gotineke kurdan heye, dibêjin, "pêşî nebe paşî jî nîn e"… Rast e, pêşiya zordestî, wêranzarî û komkujiyan heye, paşiya wê jî dewam dike… Sedsala bîstan rûreşiya xwe, radestî sedsala bîst û yekê kiriye.

Rûreşiyeke din ya mirovahiyê… Gora komkujiya kurdan ku tê gotin 3 hezar kes tê de ne, li Necefa Iraqê hate dîtin. Ev berhemê Saddam û rejîma Baasê ye. Li Tirkiyeyê jî gorên tomarî hene.

Li Tirkiyeyê, artêş û desthilatdarî senaryoyên komkujiya kurdan dikine rojevê… Bi çek… Bi çekan nebû, bi dîplomasî, bi dîplomasî nebû bi lincê, bi lîncê nebû bi êrîşên hiqûqî… Armanc têkbirina hebûna gelê kurd e… Têkbirina 25 milyonan li Tirkiyeyê û 40 milyonan li cîhanê ye…

Cîhan jî li hemberî siyasetên têkbirin û ji hole rakirina kurdan, pêr, doh û îro lîstika sê meynunan dilîze. Gunehkariya cîhana global!... Li Srî Lanka, bi sed hezaran mirovên sivîl hatin kuştin. Balkêş e û mixabinî ye ku cîhana bextreş, li hemberî vê komkujiyê jî, lîstika sê meymunan dilîze.

Min di pirtûka xwe ya bi navê SAYIN BAŞKAN de, (Nameyên ji bo Birêz Abdullah Ocalan) bal kişandibû ser rêxistineke ku li dijî lîstika "3 Meymûnan" derdikevin kiribû. Li Belçîka… Du-sê caran, ez bi wan re axivîm. Wan, rastiya xwe ya nekarî û bêzariyê dianîn ziman. Min jî gotibû, li kafeterya û di nava çar dîwarên malan de hûn nikarin dengê xwe bigihînin raya giştî. Wisa xuya dike ku hîna xwe ji fetisandina "tara bêjingê" xelas nekirine.

Min di heman pirtûkê de, bal kişandibû ser wêraniya komên xelkên Ewropa jî. Ji ber ku komên xelkê Ewropa, wek hebana pifdayî ye. Lê ev heban bi alkholo hatiye pifdan. Yanî bedeneke pûç û vala derkeitiye holê. Tenê maye iskelet û hestî… Mêjiyê di qoqê sere wan de, bûye deşo, bûye arav…

Baş tê zanîn ku berî çendekî, Iraq, Enqere, Hewlêr û Amerîka, li ser bêçekkirina PKK'ê de, li ser Konferansek Kurdan (!)diaxivîn. Bêhtir ji kurdan, Enqere, yanî tirk li ser vê konferansê diaxivîn. Ji bo bingeha wê werê amade kirin jî, li Hewlêrê hinek civîn jî hatin çêkirin. Di civînên li Hewlêrê de, nam-i diyar rewşenbîr û rojnamevanên tirk hebûn. Xwedê giravî zanyarên ku li pêşiya navê wan tîtrên Prof. Dr. (!) hebûn, axivîn. Gelo ew rojnamevan, ew nivîskar û xwedî tîtrên feylesofîk, çima ji bo gorên tomarî, ji bo kuştina zarokan, ji bo êşkenceya li jinan dengê xwe bilind nakin?

El Malîkî, bi pêşengiya dewleta tirk, ketiye nava hewldanan ku bibe mîratzedeyê Saddam. Balkêş e, heya îro 49 gorên tomarî li Iraqê hatine dîtin û El Malîkî, car din li hemberî gelê kurd di nava hewldanên balkêş de ye. Desthilatdariya Hewlêrê, û entelektuelên Başûr jî, xwe kirina "tara bêjingê". Ev tê wateya ku firazeya şerê bi dehsalan li Başûr, bêhtirîn di tevahiya cîhanî de tê fetisandin.

**Siyaset bi rêbazên bazirganiyê nayê kirin**

Me got, li Tirkiyeyê jî gorên tomarî hene. Lê eşkere nabin. Li Tirkiyeyê gorên tomarî, ji dema Îttîhad û Teraqiyan dest pê dikin, heya digihine bîrên asidê. Mîradzedeyên Îttîhadiyan, El Tayyip, Mr. Erdogan ku bi her gava xwe de, ji bo têkbirin û kiştina pêşerojên gelê kurd serî li her cure riyan didin. Niha jî, lîstikên "çeprast lê bide" kirine pratîkê. Ji aliyekî ve senaryoyên li hemberî parlamenterên DTP'ê dike rojevê, ji aliyê din ve operasyonên dijwar û berfireh didomîne, ji aliyê din ve bi devê Serokkomar Abdulah Gul, çareseriya pirsgirêka kurd kirin rojevê û nîqaş dikin.

Li cîhanê, yan jî di dîrokê de, dema pirsgirêk têne axaftin, pêşî teref, alî têne hemberî hev û di çarçoveya yaseyî û siyasî de li hev dikin, bingeha aştî û lihevhatinê sazkar dikin. Piştre kom û grubên teknîsyen têne cem hev û pirsgirêkên teknîkî çareser dikin. Balkêş e, Tirkiyeyê, pêşî gavên teknîkî diavêje. TRT 6 gaveke teknîkî ye, li zanîngehan vekirina kursiyên kurdolojî gaveke teknîkî ye, guhertina navên gundên kurdan jî gaveke teknîkî ye. Gelo çima Rêberê Tevgera Azadiya Kurd Birêz Abdullah Ocalan, ji zîndana taybet ya Îmralî nabin çiftlikekê, nabin malekê? Ev jî gaveke teknîkî ye, çima navêjin?

Ev jî dide xuya kirin ku, rayedarên Tirkiyê sivîl û eskerî, li ser lîstikên nû û senaryoyên nû li hev kirine û ketine nava hewldanan. Eger durust bin û dilsoz bin, pêwiste pêşî bi muxatabên pirsgirêkê re bêne cem hev, eger vê jî nekin, bila di Destura Bingehîn de û di yaseyan de guhertinan çêbikin.

Di pêvajoya ku çareseriya pirsgirêka kurd tê nîqaş kirin de jî, rayedarên tirk, bi bê şermî dibêjin, "pirsgirêka kurd cuda, teror cuda ye…" Ev tê wateya ku, armanca rayedarên tirk, ne mafê kurdan yê demokratîk û neteweyî ye. Parçe kirina gelê kurd û têkbirina rêxistiniya gelê kurd e.

Gotina dawî; Gelê kurd û Tevgera Kurd baş fêm kiriye ku; eger ziman hebe, cand hebe, gel jî heye. Ev jî bi erêniya yaseyî dikarê bikevê bin ewlekariyê. Yase jî bi hêza rêxistinî û leşkerî tê parastin.

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres: Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan Edene
Yayın Türü: Süreli

www.arsivakurdi.org

# Dramatîk (dramen)



Biyavên deq

Tengezarê Marînî

tengezarmarini_41@hotmail.com

Yek ji zayendên herî girîng ên toreyê, ku kartêkirina wê dîrekt li ser hiş û hestên xelkê heye, drama ye. Ev Drama çi ye? Ji ku hatiye? Çend şêweyên wê hene?

Têgeha drama, di jiyana normal de, wek wateya sosret tê fêmkirin, dema mirovek bibêje "guherîneke dramatîkî di jiyana wî de çêbû" wate tûşî belayeke mezin bû. Wate, vê têgehê di hişê civatê de, şopeke xirab hiştiye.

Drama, peyveke, ku ji zimanê yewnaniya kevin hatiye, wate, dan û standin. Eger em baş dihnê xwe bidin peyvê, dê bibînin, ku ew di hundirê xwe de, rolan di deqekî şano û operayê de an jî senaryo belav dike. Ji wan deqên, hestiyar, kovandar û matedar re drama tê gotin. Drama di gel pexşan û helbestê, stûnên sereke yê poîtizmê ne.

Ev şêwenivîs, li ba yewnan pir kevin, xwe digihîne 500 ta 700 salên beriya zayînê.

Di wan demên antîk de, çend navên ku heta niha şopa xwe li ser vî zayendî hiştin li Athen peyda dibin, mîna Sophokles, Euripides û Aischylos, hene. Di wê demê de, ew mîna helbestvanên kul û kederan (trajedî) dihatin naskirin. Ji xwe Aischylos, helbestvanê yekem ku helbest nivîsiye tê hesêbê. Aristoteles di pirtûka xwe de, Poetîka parçe dikir û dibêje ku drama ya trajedî û piştre komedî helbestên herî pak û paqij in (ji hêla giyan ve). Ji wê demê ve jî, ewropiyan kiriye destpêka dîroka drama Ewropayê.

Di wê dema ku li rojhilatê tore û di hundirê wê de, drama geş bû. gelek destanên kurdî, mîna Mîrmeh, Xerîbû, Memê Alan û gelek yên mirov dikare bibêje, ku eve kevin in, mişt in ji drama trajedî, li Ewropayê lîstik û yariyên derûnî hebûn, lê mirov nikare wan mîna drama li qelem bide. Di serdema ronesansê de guhartinek bi ser drama antîk de peyda bû. Drama bi şêweyê vebêjiyê demeke dirêj serdest bû (çîrokbêjî). Ji kevin de, drama bi herdû şêweyên xwe, -wek bikarhatintrajedî û komedî hebû, lê bê bingeheke teorî û bîrdozî bû.

Di destpêka sedsala 17'an de (1600 P.Z), dest bi danana qeyd û bendan bo wê. Li ba Shakspeare û Lope de Vega, di destpêka sala 1600'î de, hîn jî şanoya kevneşopî bû û bê teorî bû, lê şanogeriyên fransizî hatin û yasa ji bo dramayê danîn, ew jî li ser bingeha her sê yekîneyên Aristotales û ji wê demê ve, norm ji bo dramayê peyda bûn û dikarî roleke kartêker di civakê de bilîze. Ji ber wê rolê jî, peyveke Napoleon ya girîng di vê der barê de heye dibêje: „şanoyekê bide min, ez ê civateke berhemdar radestî te bikim."

Yarî, lîstik û akterî di sedsala 18'an de, ber bi pêş ve çû. Ew tîtal, rê û resmên kevin jî bûn şêweyeke û bingeh ji bo avakirina drama û bipêxistina şanoyê bi giştî. Êdî kêf û bîranînên bhiya jî bi şêweyekî ji şêweyan bûne babetên şanoyê.

Lê di sedsala 19'an de, melodrama, derbasî dramayê bû û hêza hest û şêweyê derûnî bi hêz kir. Li Almanya û bi hatina J.W. Goethe re, drama û bi taybetî trejedîk, kete qonaxeke nû de. J.W.Goethe, drama trajediya kevin, wek trajediya dilxwaziyê bi nav kir, wate, mirov dixwaze vî şêweyê binivîse û bilîze, merc nîne ku wiha be, lê trajediya modern "melodrama", pêdivî bê nivîsîn û lîstin.

Piştî van pêvajoyan, qonaxeke nû ji bo şanoyê û bi taybet dramayê dest pê kir. Di sedsala 20'an de, bîrdoziya şanoyê giha qonaxeke bilind, ku êdî li dûv pêdiviyên jiyanê, drama bi xwe jî ji bilî komedî û trajîk, bi şax û per bûn û gelek şêwe û nav derketin. Drama civakî, drama ravekirinê, an jî drama forma vekirî û ya girtî. Jixwe dema medya di navînga sedsala 20'an de, geş bû, radyo, TV û fîlmê sînemayê peyda bûn, formên nû ji bo dramayê peyda bûn, mîna drama fîlmî, dramaêzgeyê (guhdarîkirinê).

Li van qonaxên nû, em dibînin û dixwînin ku formên nû ji bo şano û dramayê peyda dibin, ew jî li gorî pêdiviyên civakê û çînên wê ne. Rewşa mirovan, di her warî de dibe sedema peydakirina formên cuda ji bo şano û dramayê. Rêbaz û metodên rahênan û dermankirina giyanî bi xwe jî ketin nav formên dramayê û we psîkodrama hate binavkirin. Di van salên dawî de, deqên dramayê gihîştine qonaxeke nû ku jêre şanoya postdrama tê gotin. Di vî serdemî de, wate serdema toreya înternetê de, cudabûneke nerm di navbera jiberxwegotin (improvision) û nivîsîna diyalogê de di riya formên guhartina rolan de peyda bûye.

Li demên Arîstotales, drama, hunerekî di navbera danûstandin û diyalogê de bû. Lewra di dema Antîk de, Drama xwe tenê ji çîrokên qehremaniyê cuda dikir. Lê li vê serdema nû xwe ji romanê cuda dike. Drama bo wê hindê ne, ku ji bo şanoyê tê nivîsîn, çunku ji bilî nivîsîn tekst, çend ferman û şîret têne dan û nivîsîn û yê derhêner, şîrovekirina ji deq re, dike kar û çalakî û dixwaze ji yarvan dike, ku wê rolê, bi vê livê û vî tonê axaftinê bilîze.

Ji xwe regez û elementên ku îro şano bi giştî û drama bi taybetî bê wan nabe, mîna dekor, ronî, bûna xalên sereke, da ku rengekî ciwan bidin û kartêkirinek şûngirtî bikin. Armanca drama ku karek bibe û dakeve ser textê şanoyê, da ku wêneyekî kartêkir li civakê bide. Drama hêdî hêdî, şaxên xwe mezin kirin. Ji wê rola ku civakê biguherînin (rola şoreşgerî!?), derbasî biyav û qadên din bû, mîna vehesîna giyan û jiyanê (opera).

Drama têgehek ji têgehên şanoyê ye, ku di riya tekst û yarîvanan re, bi diyalog û formên cuda bûyerekê, êşekê, pêkenînekê digihîne bîneran. Di perawêzên dramayê de, mirov carinan têbîniyan dibîne, ku derhêner ji bo lîstikvan dinivîse, ew bi xwe jî parçeyekî girîng ji dramayê ye. Dramayên taybet hene, ku tenê ji bo xwendinê têne nivîsîn, dibêjin wan dramayên xwendinê. Em gelek caran hinek drama bi gele şêwenivîsan dibînin, ku hem ji bo xwendinê û hem ji bo bişanokirinê ne.

Di dawî de, drama şaxek û beşekî toreyê yê girîng e, ji bo şanoyê û lîstikê tê nivîsîn. Drama yek ji kevintirîn şêweyê axaftinê ye. Di destpêka bûn û hebûna mirov, lawir û giyandaran de, diyalog peyda bûye û diyalog, beşê bingehîn ji dramayê ye.

Tiştê ku drama dikare bike, ku rêxweşker ji bo çareserkirina pirsgirêkan be, pirsgirêkan wek heyî û bi zimanekî ciwan binivîse. Di nivîsîna dramayê de, tinazok û zimanê satir û pêkenînê dikarin bibin dilxweşker û hêsanîkirin û sivikirina pejirandina rexneyên civakî. Drama danûstandina deq li ser kaxezê ye, têkiliya şanoger bi bîneran re, li ser textê şanoyê ye, beramberkirina astengî, alozî û çareseriyan e, kenê ji dil û giriyê kêlîkê ye. Wate, dema kî diyalogê bike, pêdiviye ji xwe bipirse:

Eger min karek kir, dê çi biqewime? Ev kar pêdivî bû? Min nekira dê çi bibûya? Û di dawî de, biryara min ya karî durist bû? Drama, trajedî, di estetîka Hegel de, mîna beşekî girîng ji poetîzmê ye.



sheakhzubear@gmail.com

Şêx Zubêrê Kurdî

# Li me û vê hizbê, çima dikeve cizbê?

*Ez nizanim ev dermane dê çi kulê derman bike*
*Ev simbêl qeytan dê çend malan talan bike*
*Çend mirovan bi qurbana ap û xalan bike*
*Dê çend malbatan mêvanê binê çalan bike*

Gelî zarokên agir û rojê, em ê çawa bibin sêrî dozê heta ku hinek zarokên bêbext ên hozê bi darê gûzê ji têkoşeran daweşînin tozê? Bala xwe bidinê li Tirkiyeyê her kes li ser kêşeya kurdan gotûbêjan dike? Her yek li gorî xwe nirxandinekê dike. Piraniya wan tirk in, xem nake çi dibêjin, bi kêfa xwe ne. Lê divê em kurd gotina xwe bikin yek. Ji ber vê yekê ez jî dixwazim ku konferanseke neteweyî berhev bibe û stratejiyeke neteweyî diyar bike da ku her kes kirin û gotinên xwe li gorî wê eyar bike. Lê ez bala xwe didimê hinek mirov li şûna ku xwe li gorî daxwaz û pêdiviyên gel eyar bikin, eyarê guran li xwe dikin, ew jî darê neyar digirin destê xwe û pê li me didin.

Berî çend rojan di Star Tv de bernameyek li ser kêşeya kurdan hebû, yek ji beşdarên bernameyê jî Cîgirê Serokê Giştî yê KADEP'ê bû.

Gamêrî tiştên wisa digotin, mirov şaş û metel dima. Dema mirov bala xwe dida simbêlên wî mirov digot, dê niha nirxanên wisa bike ku dûxan ji tirkan hilbe? Lê jehra marê kor kil be û çavê wî pê şil be. Ev çi zanîn hûr û kûr bû, ew çi nirxandina hûr bû? Wey wey wey! Beredayî pêşiyên me negotiye, "Simbêl bi pisîkan ve jî hene". Ew çi korfamî û kerfêmî lingên xwe xwedê li ser pişta wî bin.

Li gorî gotina wî gamêrê simbêl qeytan, gerîla ji ber rantê dev ji şer bernadin, jixwe PKK jî lewma naxwaze şer biqede. Bi rastî jî dema ku min ew gotinên wî bihîstin, min ji kurdbûna xwe şerm kir.

Gelî biraderan, gelî xwaheran her wekî pêşiyên me gotî, "Dermanê ehmeqiyê nîn e."Lê sînorekî ehmeqiyê heye, mirovekî ku li ser navê kurdan siyasetê bike, çawa dikare rabe tiştên wiha pelûpûç bibêje? Ez heyrana çavên we yên reş û belek, porê we yê kurîşk û pirxelek ma kurdinî ev qas dikeve nav lingan?

Kurdistan welatekî mezin e, kurd jî neteweyeke mezin e, hebûna partiyên cur bi cur tiştekî baş e. Em ne hewcedarê kesên hinde fehş in. Li tu welatî kes ji şervanên welatê xwe re tiştên wiha nabêje. Rûyê reş, dilê neyarên xwe hinde xweş nake. Mirov dikare xwediyê bîr û baweriyên cuda be, lê mirov hurmetê nîşanî nirxên neteweyî dide.

Tişteki balkêş e, Kengî berê dagirkeran bikeve hevraz û kêş e, serê şerxwazan biêşe, ew pêşû û hûrdegamêş digihêjin hawara wê.

Navê vê jî dibe siyaset. Gulê were ser tûyan, bila gur nexwin hûr û rodiyan. Ez hema kurt û kurmancî bibêjim, "hûn bi vê qûşê nagihêjin Mûşê". Birêz simbêl paraşût hinekî baqil be, vê bêrêziyê beraz jî nakin.

Gelî canik û camêran bi rastî ez fêm nakim ka çima bexte me wiha ye? Çima ev hizbe dikeve bi cizbê, dema ku roja çareseriyê nêz dibe?

*Çima çima çim çima*
*Gava dagirker dikevin nav xeman*
*Ew zilam digihêjin hawarê hema*
*Digirin xeman, davêjin nav çeman*
*Ji ber ku tiştek di dest wan de nema*
*Ne proje heye, ne raman*
*Ev e encama siyaseta bê ked û saman*

HAWARA EYŞO

NERAZÎBÛNA REMO




KRÎZA ABORÎ




JI PIŞT DÎWARÊN HESÎNÎ

KUMÊ ELO LI SERÊ CELO DIKIN




SIYASET Û LEŞKER




www.arsivakurdi.org

# Li ser gora Apê Mûsa

## Cejna Zimanê Kurdî

**15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî bi çalakiyên cur bi cur yên wekî panel, şahî, şano û daxuyaniyan ve dewam dike. Bi boneya cejna ziman gora zanayê kurd Apê Mûsa hate ziyaretkirin**

Şaredara navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê Ayşe Gokkan û gelek kesên din, bi boneya Cejna Zimanê Kurdî, çûn serdana gora zanyarê kurd Musa Anter.

Rêxistina DTP'ê ya Nisêbînê, Egîtîm Sen, reveber û endamên KURDÎ DER'ê jî di nav de gelek kes çûn serdana gora zanyarê kurd Musa Anter ku li bajarokê Sitîlîlê yê Bajargehê ye. Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan, endamên meclîsa giştî ya ya bajar û endamên meclîsa şaredariyê jî tevlî ziyareta gora Musa Anter bûn. Komê qurtefîl danîn ser gora Anter. Serokê Rêxistina DTP'ê ya Nisêbînê Hamît Tokay, daxuyand ku bi saya kesên di têkoşîna kurdan de jiyana xwe ji dest dane, gihîştine asta niha û diyar kir ku ev têkoşîn wê her dem berdewam bike. Tokay wiha got: "Apê Mûsa, em bi saya kesên wekî we bi nirx hatin asta niha. Em niha di şopa we de û em ê vê riye bidomînin. Erê bi saya we ye ku niha li ser kurdî nîqaşên gelek girîng dest pê kirine û em ji bo pêşxistina ziman di nava hewldanan dene. Çiqasî jî hebûna me heta niha jî qebûl nekiribin jî niha bi vekirina kanalên kurdî, dixwazin pirsgirêka kurd çareser bikin. Lê em ê tu carî nirxên we ji bo me hiştîn ji bîr nekin û her dem em ê li wan nirxan xwedî derkevin."

**'Ziman nirxê herî mezin e'**

Endamê TZPKurdî Şeyhmus Yîgît jî, destîşan kir ku nirxekî herî girîng ê gelan zimanê wan e û wiha domand: "Jiyana gelekî muzîk, exlaq, hebûna wan, nasnameya wan, li ser zimanê wan ê dayika wan hatiye avakirin. Gel bi zimanê xwe yê zikmakî tên nasîn. Ji ber wê jî em di dema meşandina xebat û çalakiyên ji bo kurdî de rastî pêkutiyên pergalê tên. Pergal ji tirsa windakirina zimanê xwe û dewletê êrîşan didomîne. Ew jî zanin ku gel jî dewlet jî bi zimanên xwe hene û tên nasîn."

**Li Êlihê pîrozbahî**

Şaxa KURDÎ DER'ê ya Êlihê bi boneya Cejna Zimanê Kurdî şahiya ziman û şanoyê pêk anî.

Şaxa KURDÎ DER'ê ya Êlihê bi boneya Cejna Zimanê Kurdî li Mala Gel a Ahmet Kaya şahiya şano û muzîkê li dar xist. Endamên Meclîsa Şaredariya Êlihê, rêveberên DTP'î û gelek kes beşdarî şahiyê bûn. Koroya Ciwanan a Koma Sorjiyan derket ser dikê û piştre lîstika bi navê, "Eşyo Tirşik" hate pêşkêşkirin. Di şahiyê de sloganên ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin berzkirin. **MÊRDÎN / ÊLIH**



*Li Nisêbînê Şaredar Ayşe Gokkan û nûnerên saziyên sivîl bi boneya Cejna Zimanê Kurdî gora Apê Mûsa ku ji aliyê JÎTEM'ê ve di sala 1992'an de li Amedê hatibû qetilkirin, ziyaretkirin û qurnefîl danîn ser gorê.*

## 'Mala Dînan' li Semsûrê bû

Di çarçoveya bernameyên Cejna Zimanê Zimanê Kurdî de lîstika koma şanoyê ya Şanoya Bajar ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ya bi navê 'Mala Dînan' li Semsûrê hat lîstin.

Çalakiyên şaxa TZPKurdî ya Semsûrê ku bi boneya Cejna Zimanê Kurdî tên li darxistin, dewam dikin. Di çarçoveya bernameya cejna ziman de lîstika koma şanoyê ya Şanoya Bajar ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ya bi navê 'Mala Dînan' li Salona Dawetê ya Şaredariya Semsûrê ji bo hunerhezan derket ser dikê. Bi sedan nûnerên saziyên sivîl, partî û bi sedan kesan eleqeyeke mezin nîşanî lîstikê da. Rêveberê TZPKurdî Alî Dara cejna ziman di serî de li dayikên kurd, li hemû kurdan pîroz kir. Dara bi lêv kir ku divê kurd êdî karibin bi zimanê xwe bijîn û bikenin. **SEMSÛR**

## Şevçira



Omer Dilsoz
omerdilsoz@yahoo.com

## Hûn xwe li kî derê dibînin

Ger hûn wisa bawer bikin ku 'pirsên ku çu carê dê bersiva wan neyê zanîn' li jiyana we peyda bûne û ev pirs wekî kurmekê hiş û aqilê we dikerojin, wê demê, careke dîtir bifikirin û pirsa 'ez li kî dera jiyanê radiwestim' li xwe bikin.

Werin em pêkve xwe berdin nav kûrahiyên hişê xwe. Li wê derê rawestin. Li xwe binêrin ka em/hûn ê çend 'xwe'yên cuda bibînin.

Çend 'hûn' hene?

Hûn ê nav malê, hûn ê li derve li kolanê, hûn ê di dîlan û mîhrîcanekê de, hûn ê li ser sehnê û li pişt sehnê, hûn ê li hemberî dijzayendê xwe û hûn ê di nav hevta û hevalên xwe de, hûn ê li pêş maçê, li ber fîlmê, li sînemayê, hûn ê di platformên siyasî de, hûn ê li qehwexane û bazarê, hûn ê li mêvandariyê û li geşt û seyranê û hûn ê êvarê li nav nivînên xwe bi xwe re tikî tenê…

Hûn ê dixwazin wisa bin û hûn ê rast…

Çend maske û rûpoşên we hene?

Hûn çend bi xwe re durist in û bi ya dil û hişê xwe dikin?

Bi van pirsan em têdigihêjin ku çend maskeyên we hebin hin 'pirsên we yên ku dê çu carê bersiva wan neyê zanîn' hebin.

A rast, her pirsa mirov li pey diçe, li nik xwe bersivekê jê re çêdike. Pêdaçûna mirovî bi ser du egeran e; an mirov ji bo ku bersiva nik xwe veşartî 'piştrast' bike li bersivan digere, an jî ji bo ku bi bersiveke rastir bi dest bixe û bersiva nik xwe veşartî 'xurtir û dewlemendtir' bike, xwe dide ser riya bersivan.

Niha em li nava hişê xwe raberî dîmeneke gelekî aloz û tevlihev in. Heke fotografê hişê mirovî bihata girtin, gelo dê çend rûyên mirovî derketana pêş?

Çend maske… Çend em?

Xasma me xwe tenê dihesiband û tim gazina me jî ev bû ku kes bi me nagihêje. Lê di vê dîmen û bergeha ji hişê me hatiye pê, wisa xuya dibe ku pirsa me ya herî mezin bi 'xwe bi xwe' re ye û em ji ber rû û maskeyên cihê yên 'xwe' nikarin bi xwe re danûstandineke 'rast û durist' çêkin û ji bo xwe ji xwe rizgar bikin, bêrawestin di nava şer û lêkdaneke ruhî û hişî de ne.

Pirsên me tên li tirsên me dialiqin û ev jî me ji hundir ve dikiritîne. Ji ber hindê, em di bin hin maske û rûyan de gelek caran xwe vedişêrin û li gorî ba û bagerê berê zîpê xwe badidin.

Çimkî, pirsa xwetemamkirin û bixwehesiyanê wekî tirsa man û nemanê li me vedigere û ev jî dihêle ku em rol û misyona xwe li gorî 'ya lê' eyar bikin.

Jixwe 'ya lê' pirseke gelemperî ye û wekî mengena eyarkirina takekesî bi kar tê.

Vê mijarê em ê careke dîtir helsengrînin, careke dîtir pirsa me ev e; gelo em li kî dera jiyanê disekinin?

We xwe dît?! Ji kerema xwe dîsa dîsa li xwe binêrin! Ji rûbirûbûna bi xwe re netirsin…

## Pirtûkeke nû: Roj Baş Heval-Qendîl

Medenî Ferho, berî salekê çûbû Qendîlê. Piştî vegeriya çavdêriyên xwe di pirtûkekê de berhevkirin.

Çend beşên çavdêriyên Medenî Ferho, di rojnameya Azadiya Welat de jî hatin weşandin. Di nivîsên Medenî Ferho de dihate xuyakirin ku Qendîl ne tenê çiya ne, ne tenê cihê şer e. Ligel ku dar, devî, kevir, av, giha hatine şewitandin jî, jiyan di nava berxwedanê de ye û xwe nû dike. Dar ji bin ve kat didin, av bi xumexum diherike, giha bihêz şîn dibin û kulîkan vedikin.

**Marên dost, dûbişkên dijmin...**

Medenî Ferho dibêje, "Ji ber bombardumanên dijmin, lawirên Qendîlê reviyane, tenê mar û dûbişk mane. Gerîla bi maran re dost e, bi dûbişkan re ne dost e. Dûbişk navê bêbextiya dijmin e. Hesreta kewan jî, bi sersibehiya rojê re dest pê dike û li gelî û mesîlên Çiyayê Şekîf bela dibe. Ligel jiyana şewitandî, hêvî dibişkivin, asoyên pêşerojên azad ji mij û moranê hatine safîkirin."

Ferho, balê dikişîne ser dûrbûna rewşenbîran ya ji Qendîlê. Ferho, hewl daye ku wate û girîngiya Qendîlê, wate û girîngiya berxwedana xwedawendî ya gerîlayên kurd, delalî û xweşikahiya Mona Lîzayên Qendîlê bîne ziman. Nivîskar, çavdêriyên xwe bi helbestên gerîlayan, bi gotinên leheng û pêşengên Tevgera Azadiya Kurd xemilandine.

Ev pirtûk bi gavekê be jî dikare dûrbûna rewşenbîran a ji Qendîlê kêm bike. Piştî Qendîl, cild I û II, Qendîl, cild III û IV jî, wê di magazîna edebiyata kurd de, bibin dewlemendiyeke mezin û bi nirx. Pirtûka Ferho ya bi navê Roj Baş Heval-Qendîl cild I û II, ji weşanên DO derket û pirtûk ji 456 rûpelan pêk tê. **FRANKFURT**

## Rêwîtiya Cannesê dest pê kir

Nazîre Turan di atolyeya Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de kamera nas kir û fîlmê wê yê bi navê 'Nar' li Cannesê hat nîşandin. Turan niha jî li ser belgefîlmekî bi mijara windahiyan, dixebite. Turan ku ji gelek derhêneran ders girtiye, bi gavên qewîn bi pêş dikeve.

Nazîra Turan ku di DÎSK'a Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de dixebitî, yekem car beşdarî Atolyeya Sînemayê ya Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bû û perwerdehî wergirt. Turan ku ji Huseyîn Kuzu, Ahmet Soner û Gultekîn Tekîk perwerdehî wergirt û bi Celal Çîmen, Perîhan Taş, Kazim Oz û Huseyîn Karabey re di heman atolyeyê de xebitî, û fîlmê "Seretîn Surem" çêkir.

Atolyeya sînemayê bi mîhrîcanê re sînorkirî nema û Atolyeya Sînemayê ya Amedê hat damezirandin. Li vir ji aliyê pisporan ve perwerdehî hate dayîn.

Turan di organîzasyonên Rojên Sînemayê li Amedê de cih girt û bi navê 'Sek Sek' kurtefîlmek kişand. Fîlmê wê li Mîhrîcana Fîlmên Seyran (gezici) ya Ewropayê û Mîhrîcana Fîlmên Kurd ya Londonê hat nîşandan û bi vî kurtefîlmî hat nasîn. Serîlêdana Turan ya ji bo perwerdehiya ku ji aliyê derhênerê navdar Milos Forman ve dihat dayîn hat qebûlkirin. Turan li Pragê li Dibistana Fîlman ya Navneteweyî ku Emîr Kusturica lê gihîştiye dersên derhêneriyê û senarîstiyê wergirt. Li dibîstanê kurtefîlmên wekî Waiting (Rawestin), Talk To Me (Bi Min Re Biaxive) û Pomegranate (Hinar) kişandin.



**Fîlm li Cannesê hat nîşandan**

Di fîlmê Hinar de windakirina firsendan, negihîştina trenê, hestên ku winda dibin û belav dibin bi hinarê ve tên tarîfkirin û di fîlm de bi pêşketina teknolojiyê ve qelsbûna têkiliyan tê vegotin. Ji aliyê akademîsyenan ve wekî çîrokeke mîtolojîk hat binavkirin. Ji bo fîlm wiha hate gotin 'fîlm qralê Binê Erdê Hadesê ku ji bo neyê jibîrkirin hinarê dide Persefoneyê tîne bîra mirov'. Fîlm bi piştgiriya TURSAK'ê ve li Cannesê hat nasandin. Fîlm dê tevî fîlmên din wekî DVD bê çapkirin û bê belavkirin.

**Vegeriya Amedê**

Derhêner piştî perwerdehiya Pragê vegeriya Amedê. Derhênera ciwan niha li ser projeya fîlmê windayan dixebite. Piştî ku di kolandinên erdê de hestî derketin, derhêner niha lêkolînan dike û amadekiriyan dike ku bi mijara windayan fîlmekî metrajdirêj bikişîne. Turan anî ziman beriya ku beşdarî atolyeya sînemayê bibe tenê temaşevaneke sînemayê bûye û wiha got: "Piştî ku beşdarî dersên atolyeya sînemayê bûm bi xwe baweriya min zêde bû. Xwesteka min ya derbasbûna pişt kamerayê li vir derket holê." **AMED**



## Bîranîn



ABDUL BAIS UÇAMAN
21.05.1992 (Licê)

Dîsa ba bûn!
Yê ku ez
hilgirtibûm…
Dilşewitî û xemgîn!
Ba ji bo min bûn!
Ku ji bo
azadiya te,
ez bibînîm…
Ez ku qîrîn bûm, ku bi
nûzîn…
Dil bi kelî bêhêvî…
Şevên min bi kul
bûn…

Şefeqên min winda….
Û ez bi bayê seherê re,
bûme bê hêvî… Gergerînek li deşt û çola,
Li zozan û çiya
Li Qele û zagan,
Li şikeft û newalan…
Ez û ba bûn,
Û evîna te
Ku hesreta taya
bê dawî…
Serketî,
û azad…

**Abid Fuat MULLACAN**

www.arsivakurd.org

# Ji dibistanê girtin û bi zorê zewicandin

Eylem Pesena xwendekara pola 2'yemîn a lîseyê ku ji hêla hevserê xwe ve hate kuştin, ji hêla malbatê ve bi zorê ji dibistanê hatibû girtin. Bi Kerem Çakanê 12 salan jê mezintir re bi mehra mele hatibû zewicandin

Jina bi navê Eylem Pesen ku ji hêla hevserê xwe yê bi mehra mele hatî zewicandin pêşî hate kêrkirin û piştre jî bi wesayîtê hate perçiqandin, ji hêla malbatê ve bi zorê ji dibistanê hatiye girtin û zewicandin. Piştî bûyerê hevserê Pesen, Kerem Çakan ku hatibû binçavkirin, hate girtin.

Kerem Çakan ku li taxa Cevdetpaşa rûdine, 7 meh berê bi mehra mele bi Eylem Pesen re zewicî. Hate zanîn ku Çakan bi hinceta têkiliya hevsera wî bi kesekî din re heye Pesen kêr kir. Çakan ku bi vê jî qanih nebû, bi erebeyê jî pêl li Pesen kir. Piştî bûyerê malbatê cenazeyê Pesen bi bêdengî li Goristana Bêkesan defin kir. Kerem Çakan jî ku piştî bûyerê hatibû binçavkirin, ji hêla dadgehê ve hate girtin. Bûyera wekî, "Kuştina namûsê" hate binavkirin, niha bi sedemên din hate rojevê. Hate zanîn ku Eylem Pesen ku xwendekara pola 2'yemîn a lîseyê bû ji hêla malbatê ve bi zorê ji dibistanê hatiye girtin û bi Kerem Çakanê 12 salan jê mezintir re hatiye zewicandin.

**Bi neçarî ji malê reviyaye**

Eylem Pesen ku dema di dibistanê de bi hevalên xwe re hê lîstik dilîst, ji hêla malbatê ve hê 18 salî ji dibistanê hate girtin. Pesen, dema hate zewicandin, ji ber temenê wê nedigirt mehra fermî jî nehate kirin. Bi mehra olî Pesen hate zewicandin. Li gorî agahiyan Pesen her tim rastî lêdana hevserê xwe Çakan hatiye. Hate daxuyandin ku ji ber vê yekê Pesen gelek caran bi neçarî ji malê reviyaye cem malbata xwe. Bavê Eylem Pesen, Necmettîn Pesen, diyar kir ku ji ber wan keça xwe bi zorê zewicandiye êşa wijdanê dikişînin. Pesen derbirî ku qatilê keça xwe ew bi xwe ye.

**'Ez qatilê keça xwe me'**

Necmettîn Pesen, da zanîn ku ew bûye sedema kuştina keça xwe û destnîşan kir ku ligel keça wî di dibistanê de xwendekareke serkeftî bû jî wan ew ji dibistanê girtiye û bi zorê dane kurxalê wê. Pesen, anî ziman ku wekî tê îdiakirin bûyer ne kuştina namûsê ye û ev tişt gotin: "Ji ber em xizmên hev bûn, min keça xwe ji dibistanê girt û bi zorê bi Kerem Çakanê 12 salan ji keça min mezintir re zewicand. Lê min nezanî dê wisa bibe. Ez êşa wijdanê dikşînim û heta bijîm jî dê vê êşê bikişînim. Lewre ez bûm sebebê keça xwe. Zavayê min Kerem Çakan ji ber nîqaşa erdê ya bi kekê xwe re kirî, aciz bûye û keça min kuştiye. Keça min 5 meh in ducanî bû û bi hovîtî hate kuştin. Ez ê wî tu caran efû nekim. Qatilê keça min, hem ez im û hem jî zavayê min ê hov e." Pesen, diyar kir ku keça wî gelek caran rastî lêdana Kaçan hatiye û keça wî reviyaye mala wan. Pesen diyar kir ku wan her tim keça xwe îkna kiriye û şandiye lê ji ber vê yekê gelek poşman in. Pesen, destnîşan kir ku dê bi riyên hiqûqî bûyerê bişopînin. Pesen got ku ji bo Kaçan cezayê herî giran bigiree dê hewl bide.

**'Dê bûyerê bişopînin'**

Meta Eylem Pesen, Besra Pesen jî, diyar kir ku wê jî bi salan ji hevserê xwe şîdet dîtiye û vê êşê baş dizane. Pesen, da zanîn ku di bin navê namûsê de bi sedan jin hatine qetilkirin. Pesen, destnîşan kir ku divê êdî çav ji van kuştinan re neyên girtin û wiha pê de çû: "Ji bo bûyer bê veşartin û xwe paqij bikin wekî kuştina namûsê nîşan didin. Lê ev ji bilî reşkirinê tiştekî din nîn e. Li gelek cihan bûyerên bi vî rengî diqewimin, lê di qeydan de kuştina ji bo namûsê derbas dikin û bûyerê vedişêrin. Em ê paşiya vê bûyerê bernedin û tiştê pêwîst bike jî em ê bikin."

Dayika Eylem, Herdem Pesen jî diyar kir ku keça wê ji ber nîqaşeke li ser malê dinyayê hatiye qetilkirin. Pesen, destnîşan kir ku şeva bûyerê jî keça wê rastî lêdana hevserê xwe hatiye. Dayik Pesen, anî ziman ku keça wê bêsûc û bela hate kuştin û ew ê paşiya bûyerê bernedin.

**WAN / DÎHA**


Eylem Pesen ji hêla hevserê xwe ve bi avayekî hovane hate kuştin.

## Li Bazîdê pêkutiyên li hemberî jinan hatin şermezarkirin

Li navçeya Bazîdê, jina bi navê Yildiz Akkuş ku rastî şîdeta hevserê xwe hatibû û piştî difn û guhên wê hatibûn birîn, ew avêtibûn qerexa rê. Jinan bi armanca şermezarkirina şîdeta li ser jinan daxuyaniyek da çapemeniyê.

Komeke jinan bi armanca şermezarkirina şîdeta li ser jinan û pêkanînên li hemberî Yildiz Akkuş li ber Peykera Mafên Mirovan a Bazîdê daxuyaniyek da çapemeniyê. Şaredara Bazîdê Canan Korkmaz, Endama Meclîsa Şaredariyê Songul Hacioglu jî di nav de nêzî 100 jin beşdarî daxuyaniyê bûn. Jinan pankarta "Em ne, namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye", "Ji pêkutiya li hemberî jinê re na", "Em jin mirov in, alîgirên hezkirinê ne" vekirin û sloganên "Ji pêkutiya li hemberî jinan re na", "Jin jiyan azadî" berz kirin.



Endama Meclîsa Şaredariyê Songul Hacioglu, daxuyand ku pêkutiyên li hemberî jinan, di bin navê "cînayetên toreyî" de tên meşandin. Hacioglu daxuyand ku bi sedan jin bi awayekî hovanê tên kuştin û li hemberî hemû cureyên pêkutiyên li ser jinan, dê tekoşîna xwe bidomînin. Piştî daxuyaniyê jin belav bûn. **AGIRÎ**

Payîz WAN

## Evînên me jî penaber bûye

Ji me re dibêjin niştecî û dibêjin penaber. Li gorî çî rêgeza niştecihî, li gorî çî panaberî? Ma gelo ev cîhana ku em lê dijîn ne warê me hemûya ne? Belê bê guman ev warê me hemûyana n. Cîhan a me hemûyane lê em hemû di heman astê de xwediyê vê cîhanê nîn in. Ji ber ku ji me hatiye standin, em ji vê yekê bê par hatine hiştin. Ne şev yê me ne, ne jî roj. Tenê em hebûnek bê nav û bêdeng li ser van warên kavil li kulmek kêfxweşî digerin.

Nizanim ku em çiqas digihijin tuxûbê kêfxweşiyê, lê em bi hêviya ku gavek berî gavekî bibînin. Şevên tarî temenê me ji xwe re pêça, êş wekî dûmana cigarê xwe berda nava dil û mêlakê me. Hemû êşê me ne qûtbûn û ên evîniyê ye. Ji her êşeka me re navnîşaneke cûda ye, lê em vê yekê baş dizanin ku tenê yek navnîşanê êşê me heye we jî penberiye. Penaberiya ji hemû tiştan, ji hemû hestan, ji hemû evînan. Ji xwe em nikarin behsa tu evînê li van warên kavil bikin. Ji ber ku evînên me jî penaber bûye. Evînên me jî wekî barana nîsanê tiranê xwe li me dikin.

Di demên we de hemû çûyînên me bê demin, hemû ji me xeyîdî ne. Hemûya pişta xwe daye me bê ku em pêbihisin. Wekî dara ku hîna di bihara temenê xwe de pel weşandî. Hîna temenê wê xinçe nedaye pela diweşî ne. Bê ku li benda bayê payîzê yê pel weşê be. Evînên me zûda xwe berdane destê celadê xwe. Ew celadê ku bi navê hezkirinê li rûyê wê evînê dikeniya.

Gelek car em dibêjin ku ji van lêvên ziware henaseyek pêwîste, lê kîjan henase? Henaseya azadiyê an jî ya celadê me?

Wekî jinan bi salan em li benda henaseya celadê xwe bûn. Ev jî bi çi navî tê kirin? Bi navê evînê, binavê eşqê. Lê me tu carî nepirsî kîjan evîne û kîjan eşqe? Ji ber ku em di nava vê dîroka lenetî de hindî bê hêz û bi tenê bûn kê henaseyek bide me, em ê li pey wan biçûna, bila ev celadê me jî bûya qet kêşe nebû. Bila tenê ji me re bigotana ku em hez we dikin ev bes bû. Dem diborî, sal diborîn cihê ku em digihiştinê heman cih bû.

Çarenûsa dayika me bû. Dayika me ji vê yekê re gotibû ev çarenûs e. Tu hêza min nîne ku serî li hemberî vê çarenûsê rakim û wekî keçên wê me jî dabû pey şopên vê çarenûsê. Lewra dayika me bermayê xwedawenda yên dawiyê bûn. Lê hemû hêza wê jê hatibû dizîn. Tenê wê jî dikarî bi bêdengiya xwe ji vê çarenûsê re îsyan bikira. Tene ew ji destê wê dihat û digot ku keça min, ez naxwazim ku tu vê yekê bijî, lê tiştek ji destê min jî nayê. Dibe ku ew jî li benda yek xilaskerî be. Ma kê dixwest vê bermaya xwedawendê ji vê çarenûsê rizgar bike.? Ya ku ew kiribû vê rewşê ne pergala zilam bû.

Di be ku hêviya wê jî keça wê be. Rojekî keça wê mezin be û bibe xilaskera wê. Ji ber ku dayikên me ji me baştir rastiyên vê jiyanê dizanin. Ji ber ku ew rûyê vê pergalê yê tazî pir baş dîti ne. Êdî ew bi yek gotinê nayên xapandin ji ber ku rastiya jiyanê ya tazî pir bi êş rûyê xwe nîşanî wan dabû. Pergala serdest bi navê zilamê wê, kurê wê, anjî axa û began di hemû qadê jiyanê derkeftine pêşiya wê. Keda wê bi gelek hêlan ve jê hatiye dizîn. Tenê ew bûn temaşevan.

# Bîranîn


Kadrî Gokdere
1957 - 2009

Kedkarê hêja KADRÎ GOKDERE piştî ku deh salan li zindana tarî li ber xwe da êdî kezeba wî ya ku ji alî zordestan ve dihate sotandin nema dikarî pê re riya berxwedana wî dewam bike.
Hevalê KADRÎ GOKDERE di hemû jiyana xwe de xwe wekî pêşeng û berpirsiyarê doza zimanê gelê xwe û mafê kedkaran da qebûlkirin.
Em soz û peymanê didin hevalê xwe ku em ê riya wî dewam bikin û ji kaniya berxwedana wî daxwazên gelê xwe av bidin. Bila rewanê te aram be hevalo heta kêlîka dawî ji jiyana xwe em ê li ber xwe bidin.

**Hemû hevalên Kadrî Gokdere yên têkoşîna li devre û hundirê zindanê**

## Di 8 parlamentoyan de parlamenterên jin nîn in

Di Parlamentoyên 8 welatên cîhanê de parlamenterên jin tune ne. Tirkiye di rêza 103'an de ye. Her wiha Tirkiye di rêza cîhanê de jî li dû Afganistan, Uganda, Vîetnam, Iraq, Tûnûs, Pakistan, Etiyopya, Sûdan û Gambiyayê tê. Di salên dawiyê de hejmara parlamenterên jin li cîhanê zêde dibe. Beriya deh salan rêjeya parlamenterên jin ji sedî 13.3 bû. Niha ev rêje bûye 18.5. Bi şiklekî din hejmara parlamenterên mêr çar caran li ya parlamenterên jin e.

Herî dawiyê li Kuveytê di hilbijartinan de 4 jin ketin parlamentoyê. Bi vî encamî li cîhanê tenê 8 welat hene ku parlamenterên wan yên jin nîn in. Ev welat, 3 hebên wan li nîvgirava Erebistanê û yên din jî welatên biçûk yên girav in. Ev jî ev in; Erebistana Siudî, Ûmman, Qetar, Mîkronezya, Naûrû, Palaû, Giravên Solomon û Tuvalû.

Li cîhanê tenê di parlamentoya Rûandayê de hejmara parlamenterên jin ji yên mêran zêdetir e. Ji 80 parlamentaran 45'ê wan jin in. Li welatên wek Swêd, Kuba, Îzland, Fînland, Holland, û Arjantînê hejmara parlamenterên jin ji sedî 40 e. Li Tirkiyeyê ji 550 parlamenteran tenê 50 parlamenter jin in. Lê parlamenterên jin herî kêm li welatên misilman in. Îro ji 200 welatan tenê li 14 welatan serok jin in. *(NETKURD)*

Hawar
21 Gulan 2009 Pêncşem

# Li gunden Licê sextakariya avê



**Qeymeqamtiya Licê ji bo ku pirsgirêka ava gundan çareser bike 16 depoyên avê çêkirin. Lê ji ber ku çavkaniyên avê tune ne, depoyên avê nayên bikaranîn. Her wiha hê jî gundî ji bîrên ku bi kîlometreyan ji gund dûr in avê dikişînin**

Li navçeya Licê ya Amedê Qeymeqamiyê ji bo ku pirsgirêka ava gundan çareser bike, bi 3 mîlyon TL'yî 16 depoyên avê çêkirin, lê niha ev depoyên avê nayên bikaranîn. Her wiha gundî hê jî ji bîran avê tînin û bîr jî bi kîlometreyan ji gund dûr in. Gundiyan diyar kir ku ji bo ku av têkeve depoyan pirsgirêka çavkaniya avê çareser nebûye. Her wiha gundiyan destnîşan kir ku ji bo vê pirsgirêkê ketine nava hewldanan lê tu encam negirtine.

**Bi salan e ji bîran avê tînin**

Yekîtiya Alîkariya ji bo Gundan a Qeymeqamiya Licê (KOYDES), ji bo çareserkirina pirsgirêka avê li gundên wekî Mêrdîniyan, Tûtê, Zoqsalan, Heragê, Bana Dêran û Cofitnê bi 3 mîlyon TL'yî 16 depoyên avê çêkirin. Du sal di ser çêkirina depoyan re derbas bû lê hê jî dilopek av neketiye depoyan. Depoyên ku bi 3 mîlyon TL'yî hatine çêkirin ji ber ku pirsgirêka çavkaniyên avê çareser nebûye, niha bi xirabûnê re rû bi rû ne. Gundî bi salan e ji kaniyan avê dikişînin û her wiha kanî bi kîlometreyan ji gund dûr in. Muxtarê gundê Mêrdîniyan Huseyîn Aslantaş der barê vê mijarê de axivî û diyar kir ku 2 hezar nifûsa vî gundî heye û bi salan e avê ji bîran dikişînin. Qeymeqamiya Licê di çarçoveya KOYDES'ê de di 2006'an de dest bi vê îhaleyê kiriye û di 2007'an de depoyên avê girtine. Aslantaş destnîşan kir ku tenê carekê depoyên avê ji bo testê bi kar anîne û piştre jî qet nehatiye bikaranîn. Aslantaş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Şêniyên gund bi salan e, bi keran avê dikişînin. Her wiha li dibistana gund jî av nayê û zarok bi bîdonan avê dikişînin dibistanê. Ji bo pirsgirêka avê çûm Qeymeqamiyê lê ji bo çareseriyê me tu encam negirt.



*Li gundên Licê bi salan e pirsgirêka avê heye, gundî ji bo ku avê bînin malên xwê bi kîlometreyan rê dimeşin.*

**Ji ber pirsgirêka avê dibistan terikand**

Keçika bi navê Derya Oguz (18) ku her roj ji bîrê avê dikişîne diyar kir ku bîr bi kîlometreyan ji gund dûr e û ji ber pirsgirêk avê mecbûr maye ku dest ji dibistanê berde. Her wiha Oguz anî ziman ku gelek hevalên wê ji ber vê pirsgirêkê dest ji dibistanê berdane. Muxtarê gundê Zoqsalanê Mahfuz Turan (37) jî anî ziman di 2007'an de 16 depoyên avê çêbûne, lê hê jî bi rêbazên kevnare avê dikişînin. Turan wiha pê de çû: "Bi giştî li 7 gund û 12 mezrayan 16 depoyên avê hatin çêkirin. 3 mîlyon TL mesref lê hate kirin. Lê niha depo hemû vala ne. Heta ku pirsgirêka çavkaniyên avê çareser nebe dê ev depo wisa bimînin. Daxwaza me ew e ku pirsgirêka gundiyan a avê di demeke nêz de bê çareserkirin. **AMED**



# Pîşeya xeratiyê ji holê radibe

Bi pêşketina teknolojiyê karê xeratiyê jî winda dibe. Li Edeneyê Hizir Balciyê 77 salî ev 55 sal in karê xeratiyê dike. Balci bal kişand ser bandora makîneyan a li ser karê wan û wiha got: "Berê dar yek bi yek dihatin nexişandin. Dergûş û taqunya dihatin çêkirin. Niha nirxa keda mirovan nemaye. Ji bo mirovan nedin xebitandin makîne hatine afirandin. Her makîneyek karê 10 mirovan dike. Ev jî rê li ber windabûna pîşeya me vedike."

Pîşeya xeratiyê, ji ber pêşketinên teknolojiyê bi windabûnê re rû bi rû ye. Mobîlya, tabure û sindoq ku bi hostetiya keda destan dihatin çêkirin, piştî ku li febrîkayan tên hilberandin, pîşeya xeratiyê girîngiya xwe winda kir. Tevî van jî welatiyên bi salan vî karî dikin, hatin asta ku kar nekin.



Hizir Balciyê 77 salî ku ev 55 sal in li Kolana Sandalyeciyan a Edeneyê karê xeratiyê dike, daxuyand ku berê pîşeya xeratiyê gelekî eleqe didît û pîşeyeke gelekî xweş bû lê niha bêqîmet maye.

**'Nirxa keda mirovan nemaye'**

Balci, destnîşan kir ku berê pîşeya xeratiyê pîşeyeke girîng bû û wiha got: "Yek bi yek dar dihatin nexişandin. Ked dihat dayîn. Mîxên kursiyan jî yek bi yek dihatin kutan. Dergûş, taqunya dihatin çêkirin. Niha keda mirovan wekî nirx nayê dîtin. Ji bo mirovan nedin xebitandin makîneyên ku karê 10 kesan çêdikin, diafirînin. Ev jî rê li ber windabûna pîşeya me vedike." Balci, bi bîr xist ku berê çi feqîr çi zengîn her kesî ji bo bebekên xwe dergûş didan çêkirin lê niha mirov alavên modern tercîh dikin û wiha domand:

**'Caran me nedixwest muşterî bên'**

"Berê ji ber zêdehiya muşteriyan em dibetilîn û me nizanibû em çi bikin û carna jî me nedixwest muşterî werin. Niha jî em rûye muşteriyan nabînin. Berê qezenca me baş bû lê niha em bi zorê debara xwe dikin. Ev jî ji ber krîza aborî û ji ber ku eleqeya mirovan ji pîşeya me re nemaye. Di demên berê de ku ji ber cihêzên keçan sindoq jêneger bûn, niha jî sindoqan davêjin koşeyan. Wateya karê me jî nema û niha her tiştî fabrîkê diafirînin. Berê min rojê 10-15 hep sindoq çêdikirin û zû zû dihatin firotin, rojê min 5 dergûş çêdikir ew jî zû dihatin firotin lê niha kes dergûşan jî nastîne."



**'Em muşteriyan nabînin'**

Balci, derbirî ku sindoqan di navbera 130- 135 TL û kursiyan jî bi 10-15 TL'yan difroşin lê tevî vî bûhayî jî muşteriyan nabînin. Balci, diyar kir ku krîza aborî li ser xeratiyê jî bandora neyînî kiriye û ev tişt gotin: "Sedema krîzê jî dewlet bi xwe ye. Ji ber nebûna muşteriyan esnaf perîşan in." **EDENE**

# Turnuvaya Aştî û Biratiyê ya Amarayê bi dawî bû

4'emîn Turnuvaya Aştî û Biratiyê ya Amara ya Futbolê ku her sal bi awayekî kevneşopî ji hêla Navenda Çanda Ciwanan a Rojava ya Enqereyê ve tê li darxistin, bi dawî bû.

Navenda Çanda Ciwanan a Rojava ya Enqereyê, her sal bi awayekî kevneşopî Turnuvaya Aştî û Biratiyê ya Amara ya Futbolê li dar dixe. Turnuvaya îsal cara 4'emîn hate lidarxistin, bi lîstika fînalê ya li Kampusa Cebecî ya Zanîngeha Enqereyê hate lîstin, bi dawî bû. Turnuvaya îsal diyarî Mustafa Dag û Mahsum Karagolan ku di dema 'Meşa Amarayê' de jiyana xwe ji dest dan, hatî kirin, eleqeyek mezin ji ciwanan dît. Lîstika dawiyê di navbera Dîclespor û Kurdên Dereng de pêk hat. Dîclesporê bi skora 7-3 bi ser ket. Piştî ku Dîclespor bi ser ket, kupaya serkeftinê wergirt. Her wiha pirtûk li lîstikvanên tîma Dîclesporê hatin belavkirin. **ENQERE**



# Zebeşên Amedê li cîhanê de navdar in

Havînê mêweya ku herî zêde tê xwarin, zebeş e. Û di nav zebeşan de jî zebeşên herî xweş ên Amedê ne. Li Amedê û li tevahiya Kurdistanê her havîn bi tonan zebeş têne firotin.

Çandiniya zebeşan li gelek welatên cîhanê pêk tê. Ji sedî 20'ê zebeşên dinyayê li Tirkiye û li Kurdistanê têne çandin. Di serî de li bajarê Amedê çandina zebeşan pêk tê.



Zebeşên Amedê gelek caran ji 40 kiloyî jî girantir tên. Piraniya welatên Ewropayê yên wekî Almanya û Fransayê zebeşên Amedê distînin.

Zebeş bi giştî li kêleka çeman, di nav xîzê de têne çandin. Dema çandinê bihar e û dema berhevkirinê jî ji havînê bigire cih bi cih heta payîzê jî diçe. Digel zebeşên ku her kes pê dizane û dixwe, li der û dora çemê Dicleyê "Zebeşên Qalikspî" yên ku qalikên wan wekî kundiran spî ne jî hene. **AMED**